

Kurdisch

(Name/ Anschrift der Schule)

Dê û bav û sergêrê/a hêja, xwendekarên hêja,

Hûn gellek bi xêr hatin bo
!

(Name der Schule)

Li dibistanê qanûnên girîng henen ku divê bi hetim werin berçavgirtin. Ev qanûn dibin sebeb ku hemî xwendekar û mamoste bikarin bi awayekî serketî hîn bibin û hîn bikin.

Li dibistana me xwendekarên keçik û lawik ji netewe, çand û olên cûrbicûr hene. Hebûna tevger û reftara dostane digel rêzgirtina li hevdu, qanûna me ya herî binirx e! Tenha li atmosfêreke dostane, dilniya û bi hevaltiyê xwendekar dikarin bi hev ra hîn bibin.

Lewma **hemû karên ku vê jiyana hevpar a dostane bêxin ber xeterê an îmkana wan a ziyangihandinê hebe**, jibo xwendekarên me qedexe ne:

- Her cûre çek
- Tundiya bi gotinê (wek Dijûn û bêhurmetî)
- Tundî û şideta bedenî (Heta eger ev tundî ji ber dijûna kesekî/e din pêk hatibe!)
- Cihêkarî
- Dizzî an ziyangihandina li malên kesek din
- Zorbêjî
- Gotina nerast/derew
- Kişandina cixareyê/vexwarina elkolê

Xwendekarên keçik û lawik li dibistana me **xwe erkdar**, jibo berçavgirtin û cihanîna van qanûnan dizanin. Eger ev qanûn bîn binpêkirin li gorî wê dê bertek bê nîşandan (Meşqên tembîkirinê, mayîna li polê, axaftina bi dê û bavan, nedana rê jibo beşdarbûna li bernameyên polê, konseyên polê, rawestandina xwendinê heta derxistina ji dibistanê).

Ji bilî wê gişt xwendekar erkdar in ku:

- li ser wextê li polê amade bibin.
- piştî tevabûna dema bêhnvedanê bêyî rawestanê ji nû va vegerin ser polê.
- hemû alav û amorên xwe hemû alav û amorên xwe yên perwerdehiyê hevrê digel xwe bînin û amade ragirin.
- bala xwe bidin ser gotinên mamoste.

- di dema lidarxistina polê da bi rêzdariya tam û bêyî derxistina dengan û qerebalixiyê tevbigirin.
- qanûnên axaftinê berçav bigirin.
- li nav polê, di demam bêhnvedanê da, di dema bernameyên dervêyî dibistanê (Gerr, hînbşûna xebatê, gerrên perwerdehiyê) bi rêzdariya tam û tevgerên baş reftar bikin.
- di tevayê heyama dibistanê da, dibistanê neterkînin.
- li parastina paqijiya hewşa dibistanê, ode û avahiya dibistanê her wiha destavan têbikoşin.
- li nav dibistanê têlêfona destan (Mobayl) an her cûre alava din a elektronîkî bi kar neynin.
- Meşqên xwe yên malê bi baldarî û birêkûpêk pêk bînin.
- Bernameya dibistanê/ nivîska peywendîgirtinê bi awayê tam û dilniya tekîl bikin.
- mal û heyitiyên dibistanê bi baldarî bi kar bînin.

Dê û bav û sergêr erkdar in ku:

- ji riya babetên terbiyetî alîkariyê bidin ku qanûnên dibistanê bînin berçavgirtin.
- heke xwendekar berî destpêbûna polê nexweş bibe, herî pirr heta saet : (Uhrzeit) bi awayê têlêfonî û bi riya hejmarên jêr dibistanê haydar bikin: (Telefonnummer)
- piştî baştirbûna rewşê nameyeke lêborînxwaziya nivîskî bi nivîsîna roja hazirnebûnê (amadenebûna li polê) raber bikin (Ev lêborînxwaziya nivîskî dikare li bernameya dibistanê/nivîska peywendîgirtinê jî were tomarkirin)
Amadenebûnên bê-eger û bê-delîl li karnameyê tên tomarkirin û dikarin bibin sedema cezaya pereyî! Heke hazirnebûnên berdewam bêyî egerekê hebin, mafê dibistanê heye ku daxwaza raberkirina guwahiya pizîşkiyê bike.
- her roj bernameya dibistanê control bikin û her hefteyê wê wajo bikin.
- têkiliya xwe ya berdewam û hertimî digel dibistanê hebin û li jiwan û qiranên ku dibistan diyar dike, amade bibin (Şeva dê û bavan, Roja dê û bavan, Civîna axaftina dê û bavan, heke mimkin e digel kesekî/ê wek wergêr).
- Guhertina navnîşan an reqema têlêfonê bilez ji dibistanê ra ragihînin.
- xercên pêwîst jibo amor û kelûpelên dibistanê an gerran (ordûyan) li ser wextê bidin an daxwaza wam li ser wextê jibo Konseya Taxê/ bajêr an navçeyê raber bikin.

Mamoste erkdar in ku:

- ji hemû xwendekaran bi awayê yeksan û beranber û bi awayê kesane piştgiriyê bikin.
- hemû hewildana xwe jibo pêkanîna atmosfêra perwerdehiya bi dostî û rêzgirtinê pêk bînin.
- civakeke dibistanî pêk bînin ku têda tu xwendekarek neyê tenêhiştin û dûrkin.
- xwendekaran ber bi palpiştiya bi xwe, berpirsiyarî û agahbûna ji berpirsiyariyê bibin.
- agahî û zanyariyên zelal û dirust li bara şiyar û liv û tevgerên xwendekaran bidin dê û bavên wan û bersiva pirs û pirsgirêkên wan bidin.
- heke pêwîst be kiryarên minasib jibo baştirkirina erênî ya şiyana zanistî û civakî ya xwendekaran pêk bînin.

Em ji qanûn û qirarên dibistanê agah bûne û erkdar in ku wan berçav bigirin.

Xwendekar (Schülerin/Schüler)

Sergêr (Eziehungsberechtigte/r)

Mamoste (Klassenlehrkraft)
(Schulleitung)

Birêvebirê/a dibistanê

Roj(Datum): _____